Elternbrief Deutsch

Wie lernt mein Kind 2 Sprachen,
Deutsch und die Familiensprache?

Nameya ji bo dê û bavan

Gelo, zaroka/ê min, bi du zimanan; almanî û zimanê
dayika xwe çawa fêr dibe?

Text / nivîs: Dr. Michaela Ulich
Übersetzung / werger (Kurdisch): Abdulkadir Ulumaskan
Grafik: Sylvia Hüsler
Seiten Design : Bilge Sümer
Staatsinstitut für Frühpädagogik - IFP München

Liebe Eltern,

Vielleicht fragen Sie sich manchmal:
„Wie lernt mein Kind Deutsch?“ oder „Kann mein Kind von klein auf zwei Sprachen lernen?“ oder auch „Wird mein Kind sich später gut ausdrücken können - z.B. in der Schule?“
Die eine oder andere Frage beschäftigt viele Eltern. Mit diesen Fragen haben sich auch schonviele Pädagogen und Wissenschaftler beschäftigt. Wir möchten Ihnen ein paar Informationen und Tipps dazu geben. Was brauchen Kinder, damit sie sich sprachlich gut entwickeln?

Kinder können gut verschiedene Sprachen lernen

Wenn Ihr Kind mit zwei verschiedenen Sprachen aufwachst, z.B. zu Hause die eine Sprache und im Kindergarten Deutsch, dann ist das eine große Chance für die Zukunft Ihres Kindes.Untersuchungen zeigen: Kinder können von klein auf gut zwei (oder sogar drei) Sprachen lernen, wenn sie in diesen Sprachen gefördert werden.Wenn Vater und Mutter verschiedene Sprachen sprechen, dann kann jeder seine Sprache mitdem Kind sprechen, auch das Schaffen Kinder. Wichtig sind dann aber, vor allem für jungeKinder, klare „Sprach-Regeln“ in der Familie, so dass das Kind eine bestimmte Sprache mit einer bestimmten Person in Verbindung bringen kann. Es weiß dann „die Mama spricht so, der Papa so, beim Essen sprechen wir so...“.

Der Kindergarten ist eine Chance für Ihr Kind

Im Kindergarten lernt Ihr Kind Deutsch und viele andere Dinge, die für die Entwicklung derSprache - und später für die Schule - wichtig sind. Daher ist der Kindergarten eine Chance und es ist gut, wenn Ihr Kind ab drei Jahren regelmäßig einen Kindergarten besucht. So hat es bis zum Schuleintritt genügend Zeit, um in die deutsche Sprache hineinzuwachsen. Die Erzieherinnen fördern die deutsche Sprache gezielt mit Spielen, mit

Gesprächen, mit Liedern und Versen, mit Bilderbüchern und Geschichte. Am Anfang, wenn Ihr Kind noch kein Deutsch könnt, wird es im Kindergarten vielleicht Freunde suchen, die zu Hause dieselbe Sprache wie Ihr Kind sprechen. Das wird dem Kind helfen, sich einzugewöhnen und sich wohl zu fühlen. Im Laufe der Zeit wird es auch deutsche Freunde finden.

Welche Sprache sprechen Sie mit Ihrem Kind?

Eltern bekommen manchmal den Rat: „Sprechen Sie mit Ihrem Kind Deutsch, dann hat es das Kind später in der Schule leichter". Dieser Rat ist falsch. Sprechen Sie in der Sprache, in der Sie ganz spontan und natürlich sprechen und die Sie am besten können - meistens ist das die Muttersprache. In dieser Sprache kennen Sie auch die meisten Wörter und Sie wissen, wie die Sätze „gebaut" sind. So bekommt Ihr Kind eine gute Grundlage, das hilft ihm dann auch bei den anderen Sprachen, z.B. beim Deutsch lernen. Es dauert viele Jahre, bis ein Kind eine Sprache richtig kann - das stimmt sowohl für die erste Sprache des Kindes, als auch für alle weiteren Sprachen. Bei manchen Kindern gibt es Phasen, in denen sie nur eine Sprache sprechen wollen - z.B. nur Deutsch. Dann antworten sie auf Deutsch, auch wenn die Eltern in der Familiensprache mit ihnen sprechen. Solche Phasen sind ganz normal. Wenn Sie selbst konsequent bleiben und weiter in Ihrer Muttersprache mit dem Kind sprechen, und wenn das Kind diese Sprache auch bei anderen Gelegenheiten hört, dann geht sie nicht verloren, das Kind lernt weiter, als Zuhörer - und wird sicherlich diese Sprache später auch wieder sprechen.

Was können Sie in der Familie für die Sprachentwicklung Ihres Kindes tun?

Das alltägliche Leben in der Familie ist wichtig für die Entwicklung der Sprache. Denn in der Familie lernen Kinder ihre erste Sprache. Welche konkreten Möglichkeiten gibt es in der Familie, Kinder in ihrer Sprachentwicklung zu fördern?

Freude am Sprechen und Erzählen

Sprache kann man nicht trainieren, sie entwickelt sich bei jüngeren Kindern jeden Tag, indem die Kinder zuhören und selbst sprechen - z.B. beim Spielen, beim Bilderbuch anschauen, beim gemeinsamen Essen, bei einer Unterhaltung mit Menschen, die sie liebhaben. Die täglichen Gespräche sind für Kinder sehr wichtig: erzählen Sie dem Kind von Ihrer Arbeit,von den Großeltern, von einem kleinen Erlebnis, das Sie heute hatten; und wenn Ihnen das Kind z.B. beim Kochen zuschaut, dann erzählen Sie dem Kind, was Sie heute alles in den Topf geben. Und freuen Sie sich, wenn Ihr Kind viele Fragen stellt und viel erzählt - was es
heute geärgert oder gefreut hat, was die Freunde im Kindergarten gesagt haben, usw. Beim Erzählen lernt das Kind allmählich sich auszudrücken und seine Ideen und Wünsche mit Worten zu erklären. Kinder lernen am besten, wenn sie sich wohl fühlen und wenn sie keine Angst haben Fehler zu machen. Manchmal erfinden Kinder auch Fantasiewörter, sie spielen mit der Sprache, das macht ihnen Spaß und ist gut für die Sprachentwicklung. Es ist nicht gut für die Entwicklung, wenn Sie Ihr Kind korrigieren, wenn es etwas „falsch" sagt. Kinder, die oft korrigiert werden, verlieren manchmal die Freude am Sprechen und Erzählen.Es gibt Beschäftigungen, bei denen Kinder sehr viel lernen und ihre sprachlichen Fähigkeiten ganz besonders gut entwickeln. Dazu gehören vor allem Vorlesen, Geschichten erzählen, Bilderbücher anschauen, Reime sprechen und singen.

Zusammen Bilderbücher anschauen

Wenn Eltern mit ihrem Kind oft - am besten jeden Tag - ein Bilderbuch anschauen, dann ist das für die Entwicklung der Sprache sehr gut. Wenn Sie mit Ihrem Kind in Ihrer Muttersprache ein Bilderbuch anschauen, dann lernt das Kind dabei viele Dinge, die ihm in allen Sprachen weiterhelfen werden und die später in der Schule wichtig sind - das habenviele Studien bewiesen. Vielleicht haben auch einmal die älteren Geschwister, die Tante oder der Großvater Zeit zum Vorlesen. Beim Bilderbuch anschauen und

vorlesen ist es wichtig, dass es dem Kind und dem Erwachsenen Freude macht (wenn Erwachsene Zuviel abfragen kann das dem Kind den Spaß verderben) dass Ihr Kind über die Bilder und über die Geschichte viel sprechen kann - alles was ihm so einfällt. Wenn Sie zu Hause in Ihrer Sprache keine Bilderbücher haben und auch keine ausleihen können, dann gibt es trotzdem eine Möglichkeit, mit ihrem Kind in Ihrer Sprache Bilderbücher anzuschauen: Es gibt viele deutsche Bilderbücher, die gar keinen oder wenigText haben. Diese Bücher können Sie in der Bücherei oder im Kindergarten ausleihen, fragen Sie die Erzieherin. Zu Hause können Sie dann mit Ihrem Kind diese Bilderbücher anschauen und in Ihrer Sprache mit dem Kind über die Bilder sprechen - und vielleicht können Sie zusammen mit dem Kind zu den Bildern eine Geschichte erfinden. Oder Ihr Kind bringt auch mal ein Bilderbuch vom Kindergarten mit und erzählt Ihnen auf Deutsch etwas zu den Bildern und zu der Geschichte. Inzwischen gibt es in Büchereien auch viele zweisprachige Kinderbücher. Wenn Sie gut Deutsch sprechen, können Sie auch abwechseln: mal auf Deutsch vorlesen, mal in der Familiensprache. Kinder haben manchmal ein Lieblingsbilderbuch, das wollen sie immer wieder hören und anschauen. Auch das ist gut, dann bekommen sie ein Gefühl für die Sprache.

Geschichten erzählen

Kinder lieben Geschichten. Wenn Kinder oft eine Geschichte hören, die der Vater, oder die Mutter, vielleicht der Onkel oder der Opa erzählen oder vorlesen, dann entwickelt sich dabei die Sprache. Sie lernen Geschichten verstehen und selbst zu erzählen, das ist später für die Schule sehr wichtig. Es können Geschichten aus dem Alltag sein, Märchen, Geschichten aus Ihrer Kindheit - alles was Ihnen und Ihrem Kind gefällt. Wie wäre es mit einer täglichen Gute-Nacht-Geschichte? Auch Lieder, Fingerspiele und Reime sind für die Entwicklung der sprachlichen Fähigkeiten sehr wichtig - und sie machen vielen Kinder Spaß. Kennen Sie noch Gedichte oder Auszählreime aus Ihrer Kindheit?

Fernsehen reicht nicht aus

Beim Fernsehen konzentrieren sich Kinder vor allem auf die Bilder, und nicht auf das, was gesagt wird. Und meistens schauen sie still zu. Das Fernsehen ist daher für die Sprache nicht besonders förderlich. Kinder lernen mehr, wenn sie z.B. eine Tonkassette mit einem Märchen hören, oder eine Gute-Nacht-Geschichte von den Eltern. Wenn Ihr Kind fernseht, dann ist es wichtig, dass Sie sich mit dem Kind über die Sendung unterhalten.

Mit zwei Sprachen leben - Kinder brauchen Vorbilder

Eltern sind wichtige Vorbilder. Manche Kinder erleben, wie ihre Eltern sich bemühen, gut Deutsch zu lernen, - z.B. fragen sie ihr Kind, wie ein Wort auf Deutsch heißt, oder siebesuchen vielleicht einen Sprachkurs im Kindergarten. Das hilft den Kindern. Sie sind dann auch selbst neugierig und stolz darauf, Deutsch zu lernen. Kinder merken auch, ob ihre Eltern die eigene Muttersprache schätzen und pflegen, und ob sie Zweisprachigkeit wichtig finden.

Sprache ist ein Schatz...

Wenn Ihr Kind zwei Sprachen spricht und sich später gut ausdrücken kann, dann hat es einen Schatz, der ihm im Leben und im Beruf weiterhelfen wird. Diesen Schatz kann ihm niemandwegnehmen. Wir wünschen Ihnen und Ihrem Kind viel Glück und Erfolg auf diesem Weg.

Dayik û bavên hêja,

Dibe ku hûn carcaran ji xwe dipirsin: „Gelo zaroka/ê min çawa fêrî almanî dibe?“ an „Ma zarok di temenê biçûk de dikare, bi hev re fêrî du zimanan bibe?“ an jî„Zaroka/ê min di dema pêş de, li dibistanê wê karibe xwe baş îfade bike?“

Çawa ku dê û bav li ser van pirsan difikirin; perwerdekar û zanyar jî bi van pirsan re mijûl dibin.Loma jî em dixwazin, li ser vê mijarê hinek agahdariyan bidin û hin şîretan bikin. Zarok dikarin zimanên cuda bi hêsanî fêr bibin. Heke zarokên we bi du zimanên cuda mezin dibin,; li malê bi zimanekî û li Baxçeyê Zarokan bi almanî, ev ji bona pêşeroja zarokên we şansekî gelekî mezin e. Li gorî lêkolînên zanistî: Zarokên biçûk ku baş bên teşwîqkirin, dikarin dudu heta sê zimanan jî bi hev re û bi hêsanî hîn bibin. Dema zimanê dê û bavê cuda bin û her du tenê bi zimanê xwe bi zarokan re bipeyivin, zarok wê karibin bi her du zimanan jî bipeyivin. Lê divê axavtinên nava malbatê bi rêzik pêk werin. Wê demê zarok dikarin têkiliya di navbera ziman, kes û bûyeran de ava bike. An na, zarok dikare, bifikire: „Diya min waha, bavê min waha dipeyive û li ser xwarinê em bi aweyekî din dipeyivin.“

Baxçeyê Zarokan ji bona zarokên we şansek e

Ji bona Baxçeyê Zarokan û dibistanê, zimanê almanî ji bo zarokên we gelekî girîng e. Zarok li Baxçeyê Zarokan, gelek tiştên ku ji bo pêşketina ziman hîn dibin. Loma jî piştî sê salî, çûyina Baxçeyê Zarokan ji bo wan şansek e. Ev dem heta destpêka dibistanê ji bo pêşvebirina hînbûna almanî demeke baş e û têrê dike. Perwerdekarên Baxçeyê Zarokan, li gorî armancan; lîstik, axavtin, stran, çîvanok, pirtûkên bi wêne û çîrokên guncaw; zarokan teşwîqî fêrbûna almanî dikin. Heke zaroka/ê we qet bi almanî nizanibe, belkî pêşî li zarokên bi zimanê xwe yê dayikê dipeyive bigere. Ev, wê ji bo xwe aram sehkirin û fêrbûna der û dorê bibe alîkar. Zarok wê di nava demê de ji xwe re hevalên alman jî bibîne.

Hûn bi zarokên xwe re bi kîjan zimanî dipeyivin?

Hinek caran malbat tên şîret kirin û ji wan re tê gotin ku: „Bi zarokên xwe re bi almanî bipeyivin daku di dema dibistanê de zahmetiyê nebînin.“ Şîretên bi vî rengî ğaş in. Ji bona we ya herî rastî, ew zimanê ku hûn baş pê dizanin e. Ew ziman jî bi gelemperî zimanê we yê dayikê ye. Divê hûn bi zimanê xwe bi zarokên xwe re bidin û bistînin. Ji ber ku hûn herî zêde peyvên bi zimanê xwe û avakirina hevokan bi wî zimanî baştir dizanin. Bi vî aweyî zarokên we, wê karibin bibin xwedî bingeha zimanî ya zexm û dîsa li ser vê bingehê wê karibin zimanekî din, wek mînak zimanê almanî baştir hîn bibin. Hin deman, zarok herdem dixwazin bi almanî bipeyivin. Dema dê û bav bi zarokan re bi zimanê xwe bipeyin jî ew dîsa bi almanî bersîv didin. Ev tiştekî gelekî normal e. Lê ger dayik û bav bi biryar û prensîb bi zarokan re bi zimanê xwe peyivîne berdewam bikin û zarok vî zimanê li derdorê jî bibihîze, helbet wê rojekê hînî zimanê xwe bibin.

Di nava malbatê de ji bona pêşketina zimanê zarokên xwe, hûn dikarin, çi bikin?
Ji bo pêşketina zimên, jiyana malbatê ya rojane gelekî girîng e. Ji ber ku zarok, zimanê xwe yê pêşîn di nav malbatê de hîn dibin. Ji bona teşwîqkirina pêşketina zimanê zarokan, kîjan derfet hene?

Kêfxweşiya axavtin û vegotinê

Antremana ziman tuneye. Ancax ji bona zarokên biçûk, ziman; bi lîstikê, lênerîna pirtûkek bi wêne, di demên xwarinê de, bi kesên ku jê hez dikin re sohbet kirinê, bi bihîstin û peyivînê, roj be roj pêş ve diçe. Axavtinên rojane ji bo zarokan pir girîng in. Ji zarokên xwe re qala karê xwe bikin.
Bahsa kal û pîran bikin. Di jiyana xwe ya rojane de bûyereke biçûk vebibêjin. Heta di dema çêkirina xwarinê de, heke zarok li cem we bin; jê re ew tiştên ku hûn dixin beroşê, yek bi yek navên wan bibêjin. Dema zarokên we, ji we re li ser jiyana xwe ya rojane û têkiliyên bi hevalên xwe re, hestên xwe bibêjin û hinek pirsan ji we bikin, divê hûn kêfxweş bibin. Zarok di

dema vegotinê de hêdî hêdî xwe îfade dikin û fêrî gotina, dîtin û xwestekên xwe dibin. Zarok gava ku xwe rihet bibîne û tirsa ji kirina şaşitiyan tunebe dikarin bêtir hîn bibin. Zarok carna peyvên fantazî diafirînin û bi binyata zimên dilîzin. Ev fantaziyana kêfek mezin dide wan û ev yek ji bo pêşketina wan a ziman gelekî pêwîst e. Dema ku zarok dipeyivîn û hinek şaşitiyan dikin, divê hûn ji bo sererstkirinê zêde mudaxele nekin. Ji ber ku ev helwest li ser pêşveçûyina wan bandorek neyênî dike. Heke mirov zêde têkeve nava hewldana sererastkirina şaşiyên wan, ev dikare bibe sedemê sarbûna zarokan ya ji axavtin û vegotinê. Ji bo fêrbûna zarokan û bi taybetî jî pêşketina behremendiya wan ya ziman, hin tişt hene ku alîkariya wan dikin. Ji wan yên herî girîng ev in: Venêrîna pirtûkên bi wêne, bi dengê bilind xwendina pirtûkan, vegotina çîrok, çîvanok û stranan.

Bi hev re lênerîna pirtûkên bi wêne

Heke malbat her roj bi zarokên xwe re li pirtûkên bi wêne binêrin, ev tiştekî ji bo pêşketina zarokan a ziman gelekî bi kêr e. Bi gelek lêkolîn û vekolînan hatiye îspat kirin ger hûn bi zarokên xwe re li pirtûkeke wêneyan ya zimanê xwe binêrin; ev di dema pêş a dibistanê û fêrbûna zimanekî din de dibe alîkariyeke mezin. Hin caran; bira, xweh, xaltî, met, dapîr û bapîr jî dikarin ji zarokan- re wan pirtûkan bixwînin. Di lênêrîn û bideng xwedina pirtûkên wêneyî de ev xalên jêrîn girîng in: Divê ev rewş, kêfxweşiyekê bide zarok û mezinan. (Heger mezin her tiştî pir zêde bike mijara lêpirsînê, dikare ku kêfxweşiya zarokan ji xwendinê re nemîne.)Divê zarok, li ser wêne û çîrokan, çi tiştên bên bîr û bala wan karibin, bipirsin û bibêjin. Heke li mala we bi zimanê we yê dayikê pirtûkên bi wêne tunebin û hûn nikaribin ji derekê peyda bikin, dîsa jî hûn dikarin bi zimanê xwe li hinek pirtûkan binêrin. Ji perwerdekar û pirtûkxaneyan bipirsin û pirtûkên tenê bi wêne an jî yên nivîsen kurt bi zimanê almanî deyn bikin û li mala xwe li ser wan wêneyan bipeyivin. Dîsa hûn dikarin tevî zarokên xwe li ser van wêneyan bi zimanê xwe hin çîrokên kurt jî ava bikin. An zarokên we dikarin, her carê ji Baxçeyê Zarokan pirtûkekê bi xwe re bîne, li ser wêne û çîrokên wan bi almanî jî bi we re bipeyivin. Ji xwe, êdî bi duzimanî gelek pirtûkên zaro-

kan jî dikare bên peyda kirin. Heke zimanê we ê almaî baş be, hûn dikarin ji zarokan re pirtûkan carekê bi zimanê dayikê û carekê jî bi ê zimanê almanî jî bixwînin. Yek caran zarok ji wêne û çîrokên jê hez dikin; qet aciz nabin û her dixwazin lê binêrin. Ev jî normal e û ji bo pêywendiya wan a bi ziman re dibe alîkariyek baş.

Vegotina çîrokan

Zarok zêde ji çîrokan hez dikin. Heke zarok ji mezinên xwe çîrokan guhdarî bikin, zimanê wan pêş dikeve. Bi vî aweyî çîrokan fêr dibin û fêrî vegotinê jî dibin. Vegotinên we, dikarin çîrok û çîrçîrokên ji jiyana we a rojane, serpêhatiyên dema zarokatiya we an jî her tiştên ku hûn û zarokên xwe jê hez dikin be. Wê gavê gelo, hûn her şevê ji bona „Çîrokeke Şev başiyê“ çi dibêjin? Ji bo behremendiya peyvandina zarokan; stranên jê hez dikin, lîstikên bi tiliyan û peyvên biqafiye pir girîng in. Ma, ji salên zarokatiya we; helbest an jî çîvanokên di bîra we de mane, qet nîn in, gelo?

Telewîzyon têrê nake

Dema ku zarok li telewîzyonê temaşe dikin; bala wan ji gotinan bêtir diçe ser dîmenan.Zarok bêyî ku bipeyivin, li telewîzyonê temaşe dikin. Loma jî telewîzyon ji bona pêşketina zimên ne zêde baş e. Wek mînak zarok ji kaset an CD´yekê çîrokekê guhdarî bike, an ji dê û bavên xwe çîrokekê „Şev baş“ bibihîze wê bikaribe bêtir tiştan fêr dibe. Heke zarokên we telewîzonê temaşe dikin, qet nebe li ba wan rûnin û li ser tiştên lê temaşe dikin, pê re bipeyivin.

Jiyana duzimanî - pêwîstiya zarokan bi kesên ku ji wan re bibin mînak heye:

Dê û bav ji bo zarokan mînakên herî girîng in. Dayik û bavên, baş bi almanî nizanin û hewldana wan ya ji bo fêrbûnê ji zarokan re jî dibe motivasyoneke baş. Wek mînak peyveke almanî ji zarokan bê pirsîn an jî beşdarbûna dê û

bavan a kurseke ziman, ji bo zarokan tiştekî girîng e. Bi vî aweyî baweriya zarokan ya bi xwe û meraqa fêrbûna almanî pêş ve diçe. Bêyî vê dîsa zarok; helwesta dê û bavan a nirxdayin û parastina zimanê xwe ê dayikê dibînin û ev bandoreke erênî an neyênî li wan dike. Cardin zarok, girîng girtina malbatan a duzimanî jî dibînin û têdigihêjin. Loma, divê malbat haj ji van mijaran jî hebin û ji bo zarokên xwe bibin mînakên erênî.

Ziman gencîneyek (xezîneyek) e …

Heke zaroka/ê we her du zimanan jî baş bizane û di pêşerojê de xwe baş îfade bike, ev di jiyana wê/wî ya taybet û ya pîşeyî (meslekî) de wê her dem xwedî gencîneyeke alîkar be. Tu kesek, wê nikaribe vê gencîneyê ji destê wan bigire.

Em, di vê riyê de, ji we û zarokên we re şansekî zêde û serkevtinê dixwazin.

Ev xebat bi hevkariya Yekîtiya Mamosteyên Kurd û Însîyatifa Malbatên Kurd li Bielefeldê hatiye çapkirin.

Verein Kurdischer LehrerInnen in Europa e.V.
Yekîtiya Mamosteyên Kurd -YMK

www.denge-mamoste.com
E-Mail: ymk@denge-mamoste.com

Kurdische Elterninitiative OWL
Însiyatîfa Malbatên Kurd
li Bielefeld
kurd.eltern.int@gmail.com
zerifa@hotmail.de

Insbesondere bedanken wir uns bei dem Kommunalen Integrationszentrum Bielefeld für die großartige Unterstützung.